

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 129)* *Sal 22* *Avrêl 2017 z - 2629 k* *Buha (75)L.S*


## Erdoxanê Îxwan.. û Tirkiya Winda!!

**Desteya sernivîser**

Li ber destê siba 25 Avrêlê, refin ji balefirên cengê yên dewleta tirkiyê dane ser çiyayên Qereçoq û Şengalê û baregehên hêzên kurdî bombebaran kirin. Li roja din 26-27ê Avrêlê jî, gelek gund û warên Kurdan li navçeyên Cezîr û Efrînê bi hemî cureyên çekan hatin bombebarankirin. Di encama ew hêrişên kîndar de bi dehan şervanên YPG û Pêşmerge jiyana xwe ji dest dan.



// Komîtanên Emrîkî û YPG ê li cîgehê Qere Çoxê meyzedikin //

Ev ne cara yekê ye û dê ne ya dawîn be jî, ku destlata Erdoxan rûyê xwe reş dike, gelê Kurd û warê wî dike armanca hêrişên xwe û bi kiryarên xwe yên çepel, û bi rengekî yekser û ne yekser alîkariya hêzên têror û di serî de rêxistina DAIŞê dike.

Nakirina Emerîka ji beşdarbûna (xapînok) ya artêşa Tirk di şerê rizgarkirina bajarê Reqayê ji destê Dewleta Îslamî, ……… ❷

---

## Xelata Kemal Henan

### A pesendkirina nivîsandina bi zimanê kurdî

Bi boneya Roja Rojnamegeriya Kurdî, li roja 22/4/2017an rêxistina Kobanê ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê, komcivînek gelêrê li gundê Til Xezalê- Kobanê li dar xist.

Komîta Xelata Kemal Henan a Pesendkirina Nivîsandina bi Zimanê kurdî, biryar dabû, ku îsal du mamosteyên zimanê kurdî li KOBANÊ bi şêweyekî hevpar xelat bike. ew jî her du mammaste: Emel Etî û Niştiuman Hecî Mûrad bûn. Li destpêkê, endamê komîta xelatê Arif Hiso silavên endamên komîtê gihandin beşdaran. Paşê li ser sinciyê nemir Kemal Henan û kar û xebata wî ya li dirêjiya dehsalan di warên guhdana bi zimanê kurdî , nemaze di warên xwendin û nivîsandinê de ji beşdaran re xuya kir. Her du mamosteyên xelatrkirî jî dilxweş û



dilşahiya xwe ji bo wergirtina xelatê diyar kirin û soz dan ku ewê çalakî û xebatên xwe di ber zimanê kurdî yê şêrîn de bilindtir bikin û ji xelatkirin, rûmetkirinê û şopa Kemal Henan re dilsoz bin.

**Erdoxanê Îxwan .... Dûmahîk**

peyam û gubîskirineke bû ji destlata partiya AKP re. ji ber ku Emerîka û hemî raya giştî têkliyên dewleta Tirkiyê bi rêxistinên Têror re eşkere bûne û hatine naskirin. Baş diyar bûye, ku armanca wê ya serke gelê Kurd e. Loma jî Emerîka, Ewrupa, Rûsya û bilî wan jî baweriyê bi soz û gotinên Erdoxan û daxwazên wê nabe. Ji bilî ku Emerîka ne gêjike ku destê xwe têxe bin kevirê Erdoxan û paşê li razîbûna wî bigere. Ew baş dinêrin û têdigihên ku hevalbendiya wî bi partiya nijad perest MHPê re, hevbendiyeke olî-Toranî li hember hêzên demokrat û zanîngir, ne tenê li Tirkiyê, lê li hemî Rojhilata Navîn çêkirine, bi taybetî jî, li dijî gelê Kurd yên mafdar û aştîxwaz. Raya giştî tev tê gihiştiye ku hevbendiyek mîna wê, ji bilî dijîtiya wê ji Kurdan û ji jiyana Demokrat re li Tirkiyê, tiştekî din jê netê û jê hêvî nabe. Gelek çavdêr dibînin, ku hêriş 25-26-27 Avrêlê li dijî baregehên hêzên kurdî, jî ji berhem û encama hevbendiya şoven û faşêst di navbera AKP û MHP de bûbû. Ew razîkirin û berdêleke ji helwesta MHPê ji raspirsînê re, û dê ta demekê berdewam jî bikin.

Ciyê dilxweşiyê ye, ku ew hêrişên hov pêrgî helwestek neyînî û eşkere ji hêla her du dewletên têkildar Emerîka û Rûsya de hatin. Ew helwesta navdewletî ya şermezarkirinê cihê vehesî û razîbûna gelê Kurd û nofeke mezin ji şêniyê Bakurê Sûryê bû. Tedbîrên ku ji hêla wan her du dewletan ve, ji bo


Çiyayê Qere Çoxê

nêrevaniya sînorê Tirkiyê bi herêmên kurdî re li Bakurê sûryê bikin, hinek hêvî li ba xelkê me peyda kir. Ew hêvî dikin ku ewê aramiyê li navçeyên ku ji hêla Hêza Sûrya Demokrat de têne parastin biçespîne û ji artêşa Tirk re jî bibe bend û nehêl.

Germkirina sînorê Tirkiyê, niha jî û li demên pêş jî, tenê dikeve xizmet pêlanên dewleta Tirk û berjewendiyên wê û hêzên têror pêk tîne. Loma jî, Tirkiya nû ya AKP û MHP dixwaze sînor germ bike, da ku dijîtî û neyartiya xwe ji navçeyên kurdî re wek berevaniyeke rewa bide xuyan. Bê guman ev xala giring di bala rayedar û berpirsiyarên YPG û Rêvebirya Xweser de ye û netê jibîrkirin. Çinkî bêhna faşîzmê ji pêlana hevbendiya Olî-Toranî ku Erdoxan serkêşiya wê dike, tê.

Çavdêr li hev dikin û dibêjin, ta niha Kurd li ser riya rast in û bi hişmendî kar, xebat û siyaseta xwe dajon. Ta niha navçeyên me aram û parastî ne, dewletên mezin ji siyaset û helwestên me razî ne. 1 pirs ew e, gelo ma em jî kanin di navbera ev hêzên xwedê berjewendiyên têvel de hevpîvanê çêbikin û navçe, gel û mafên xwe biparêzin? Belê! Em kanin! Çinkî Kurdên îro ne kurdên berê ne, ew ne nezan û çavgirtî ne, heyam li cîhanê jî ne ya beriyê, ew jî hatiye guhertin û herwiha rê li pêş gelê me vebûye!!

Bo şermezarkirina dijberî û hêrişên balefir û hêzên tirkî li ser navçeyên kurdî li Sûryê û Şengalê, û mebest û armancên wê. Mihidîn Şêx Allî sekretêrê partiya me Yekîtî Demokrata Kurd li Sûryê jî daxuyanek ji raya giştî re hinart û wî jî armanc û mebesta hêrişê dewleta Tirkiyê wiha rave kir: ((… ev dijberî û hêrişa tirkiyê ya buvedar, li ser bingeha gurbûna qeyranên hundirê Tirkiyê hate kirin. Tirkiyê hîn li ser siyaset û kiryarên xwe yên gumankar di rewşa hundirê Sûryê de bi rik e, nemaze jî di armanckirina Kurdan de… Mebesta Tirkiyê ya bingehîn ji wê dijbertiyê, ew e ku Yekîneyê Parastina Gel li xwe biheyrîne, û rola wê ya bingehîn di dorpêçkirin û û têkbirina Rêxistina Dewleta Xîlafê (DAIŞ) ji bajarê Reqa ya Sûrî re ku wek paytexta day nasîn, lawaz bike…)).

# Çareserî di Sûriyê de di nenavendiya wê de ye

Qaziqlî Mihemed



// Hilweşandina li Helebê //

Weke em zanin, Sûriyê welatekî pir netew, ol û bineol e. Sazûmana ku li Sûriyê destlatdar e jî, sazûmanekî navendî, zordar, şoven… û yekalî ye. Vê rewşa kambax Sûriyê gihand vê deraqî ji tarûmarkirinê. Va ye şeş sal ji hevdûkuştin, bombebarankirin, penaberbûn û koçberiyê diqedin û hîn jî dawiya wê ne xuya ye. Ji bo dîtina çareseriyekê bi dehan hevdîtin, pilatform û konfiransên navxweyî, herêmî û navdewletî (Cinêf1 2-3..,Viyêna, Firansa, Qahîre, Mosko, Si`ûdiya Erebistan, Enqere, Himêmîm, Esîtana, Mosko,…) hatin lidarxistin. Lê ta vê kêlîkê tu çareserî- ji ber gelek sedemên hundir û derve û nelihevhatina berjewandiyên destêwerdêran- nehatine dîtin. Di her hevdîtinekê de, gotin û nêrînên curbecur pir dibin, hin bi guman in, hin geşbîn in û hin jî reşbîn in. Wek em dibînin, ger aliyên Sûrî bi van xalên jêrîn bawer nebin, zincîra hevdîtinên lêgerîna li çareseriyê wê dirêj û berdewam be, û berjewandiyên Sûriyê û xelkê wê jî, wê di nav civlika berjewendiyên hêzên navdewletî û herêmî yên têkar de bigevizin û di nav lingan de bimînin. Ew xal jî: 1-Şer kirîzê aloz dike, û derman jî tenê di çareseriya siyasî de ye. 2-Sûriyê pirpêkhate ye, ji Kurd, Ereb, Suryan, Keld û aşûr, Dirûz, Turkmen, Çerkez, Misilman, Fille, Êzdî, Sinî, Elewî…Û H.W.D pêk tê. 3- Çi çareserî be, divê tabloya curerengiya Sûriyê wek heye bibîne. 4-Çareseriya siyasî bi hevdûpejirandin û guftûgoyê dest pê bike.

Di vî warî de, em Kurd, çawa mafên me hene, weha stubariyên me jî hene. Vêca Tevgera siyasî ya kurdî ji zû de gotiye û dubare kiriye, ku gelê Kurd li Sûriyê beşek e ji gelê Sûryê, herêmên kurdî jî (Efrîn, Kobaniyê û Cezîr) beşek ji welatê Sûriyê ne. Weke çawa ew ji aliyê dîrokî ve bi Kurdistanê ve girêdayî ne. Tevgera kurdî jî pareke sereke ye ji Tevgera niştimanî ya sûrî. Weha jî pirsa kurdî ji pirsa Sûriyê ya giştî nayê veqetandin. Îro piştî ewqas xişim û bêtarê ku navendîtiya destlatê sersebeb bû, di baweriya me de, nenavendîtiya wê jî dermanê çareseriya wê ye. Çimkî weke me berê gotibû, ji alîkî ve Sûriyê pirpêkhate ye, û ji aliyê din ve jî destalata navendî hertim setemkarî û zorê diafrîne. Çiqas silogan, piroje û têrmên siyasî ji aliyê me Kurdan ve werin pêşkêşkirin, çareserkirina pirsa me ji çareseriya giştî ya Sûriyê nayê cudakirin. Ew bi rengê sîstem û destûra wê ya siberojê- ewên ku ta niha diyar nebûne- ve girêdayî ye. Ew diyarbûna jî girêdayî gelek nîrên (kurdî, sûrî, herêmî û navdewletî) ye. Ta ku ew piroja giştî -pirsa kurdî jî di nav de- derkeve holê, pir jihevkêş û hathev- li gorî mercên hikardar- wê çêbibin. Lê li dawiya dawîn, çareseriya ku hêminî û aramiyê li Sûiyê çêbike û nehêle zordarî vegere, sazûmaneke nenavendî (rêvebiriyên xweser, Federal , …) ye. Çareseriya pirsa kurdî jî wê di çarçewa giştî de be. Lê çiqas hikarî pir bin, hêmana herî bi bandor di tiştê bi me Kuran ve girêdayî yekrêziya me ye, û giraniya me ya li ser zemînê ye. Bi taybetî jî parastina rêvebiriya ku heye, û Yekîneyên parastina Gel Y.P.G û Y.PJ ne.

# Bîranîna 102yan a Qirkirna Gelê Ermen



Gelê Ermen li Rojhilata Navîn ji rûniştvanên resen e. Ew li dirêjiya serdemên dîrokî li ser navçeyên fere ji deverên Çiyayê Qefqas, Toros û Zagrosê jiya ye. Li serdemên dirêj, Ermen herdem hemsiyên Kurdan bûn, û jiyana xwe bi hev re, bê arîşe û pirsgirêk berdewam dikirin û hîn jî wilo ye. Gelê Ermen dewlet û mîrîtî jî li wan deveran ava kirine. Li berî zayînê bi dora sed salî, qeralê Ermen Tîgranê Mezin, dewleteke fere li Asiya Biçûk ava kir û ra Deşta Adenê û perava Derya Sipî xist nava sînorên dewleta xwe.

Ermen gelê destpêkê bû ku li Rojhilata Navîn ola Pêxember Îsa pejirand. Kinseyên destpêkê jî li welatê wan hate avakirin. Digel ku hêzên Îslamî gihîştin Ermenistanê û demine dirêj lê bûn destlatdar, lê li bervajî Kurdên ku ola xwe ya Zerdeştî berdan û Îslam bûn, Ermen li ser ola xwe ya Fileh man û baweriyên xwe bernedan.

Kurd û Ermen bi hezara salan wek du gelên bira li ser xakeke hevbeş biratiyeke durust û hevgirtî ava kirine, parastine û hîn jî wiha ye. Ew têkliyên dîrokî, xaknîgarî, şaristanî û civakî yên durust li serdema dagîrkirina Osmaniyan ji welatên wan re jî berdewam kirin, nehatin şikandin û hîn berdewam in.

Lê belê, gelê Ermen belkî bi hoya cudatiya olî di navbera wan û Osmaniyan de, û ji ber egerine din jî, ji dewleta Rûsan ve nêzîktir bû. Tevgera netewî jî li ba wan zû dest pê kir û xurtir bû, nemaze jî li dawiya sedsala nozdan û destpêka bîstan. Lewre jî, li dema ku Şerê Cîhanê yê Yekem dest pê kir, û artêşa Rûsî ji Qefqasê berve Rojhilata Anadolê daket, çalakvanên Ermen derfet dîtin û bi serhildanên mezin li dijî dewleta Osmanî rabûn.

Li wê çaxê, ango di sala duyam de ji şerê cîhanî, destlata Osmanî gelek navdar û gernasên Ermenan girtin û li roja 24 Avrêla 1915an li Stenbûlê bi dar ve kirin. Fermana koçkirin, qirkirin û derkirina Ermenan ji nav sînorên dewleta Osmanî jî derket. Ji ber wê fermanê, û li gora serhejmarên wê serdemê, dora milyon û nîvek ji Ermenên sivîl hatin kuştin, hin bi destên artêşa Osmanî, hin li çol û baniyan ji tî birçîna re jiyana xwe ji dest dan û bi qaserî wan jî mişext bûn û bi welatan ketin. Bi rastî, fermana siltanê Osmanî Ebdilhemîdê Duyem bi qirikirina gelê Ermen û mişextkirina wan, kiryareke hov a bê mînak bû. Hemî jêderên nevdewletî û belgeyên dîrokî jî dewleta Osmanî ji ber wê qirkirina mezin de gunekar û berpirsiyar dibînin.

Lewre jî, Gelê Ermen her sal û li her derekê, li 24 miha Avrêlê reşa xwe girê dide, û boneya ((Qirkirina Mezin)) bi bîr tînin.

Bi wê boneyê, gelê Kurd jî bi hest û nestên xwe yên dilsoz û zelal li kêleka gelê Ermen disekine û hovîtiya Osmaniyan û neviyên wan (Osmaniyên Nû) şermezar û riswa dike.

Ji gelê Tirk tê xawstin, ku li dîroka xwe vegere, kiryarên artêşa Osmanî û dîroka destlatdariya wê ya reş, nemaze di tenga gelên Ermen û Kurd re mixabiniya xwe bide, û li mafên wan yên dîrokî û netewî mikûr were.

Bimire nezantî, şovenîst û nijadperestî.. Bijî biratiya gelan .

# ALOZIYÊN DERÛNÎ

Îlham Osman

Her mirovek di jiyana xwe de, kedeke bêhempa dide, ta ku bigihêje armancên xwe û di cihê bawerî û payebilindiyê de balan bikşîne. Bêguman gerek e ev mirov di malbat û rewşeke qenc de bijî. Yek ji mercên mirovê serkeftî û ji xwe bawer, ew e ku di etmasfêreke hevseng de mezin bibe. Lê ev derfeta ne li ber destê her kesekî ye. Bêtirî %70 ji malbatên kurdî di têkiliyên tevlihev de berdewam in. Ango ew ji guhdana bi hest, êş, pirsgirêk, daxwez û nêrînên bi hev re dûr in. Ev jî rêyê li pêş bêbawerî, kîn û şaştiyan vedike. Gelo ma çawa mirov bi xwe bawer dibe?? Bêguman gava malbat bi hezkirin, rêzgirtin û guhdana bi hev tên girêdan, encama wê nifşekî geşbînî û çalak diafrîne. Divê ji hawîrdora ku tê de temenê xwe diborîne hezkirinê jê bibe. Ji teşeya xwe ya derve û hundirîn razî be. Xwe kêmî kesî nebîne. Bê tirs bi civakê re têkildar be. Di gotebêjan de nêrînên xwe serbest bêje, ta şaş bû jî, bila tucarî li rûyê wan nebêjin: Bêdeng bin, hûn nizanin, filan ji we çêtire... HWD. Ji ber ku ev dihêle di çalên êşan de jar bibin, nexweşiyên derûnî pê re çêbibin, û di bagera guman û tenêtiyê de noq bibin. Çinkî weke bertek, carina reftariya wan têkdar dibe. Jiyan li ser rastî û şaştiyê hatiye afrandin, ew hêmana wê ya bingehîn e. Lewra tu kesî di şaştiyan re derbas nebe tuneye. Lê mirovê ji xwe bawer, dîsa li ser pêyan disekine, û ji şaştiyên xwe hişmendiyekê radike. Beravajî wê, mirovê ji xwe ne bawer, di çarçoveya lome, kovan û bedbîniyê de hêdî hêdî ji jiyanê qut dibe. Ger vê mijarê di dema niha de bişopînin, em ê bibînin ku taybetmendiya (ji xwe nebawer) di pir kesayetiya miletê Suriyê de diyar e. Ew ji talan, kuştin, lêdan, koçberiyê aloziyên civakî, aborî û derûnî hatine holê, û mirov jê bandor bûye, her kesek li gorî dijwariyên ku tê re derbas bûye. Bi pileyên curbecurb ji xwe bêbawer bûne û hîn jî pisgirêk berdewam e.. Gelo ma civakeke wilo nexweş, çi nexweşiyên canî yan derûnî bin, rola wan dê di pêşeroj de çawa be?!!!

# Çalakiyên Roja Rojnamegeriya Kurdî



Bîst û diduyê mehma Avrêlê roja rojnamegeriya kurdî ye. Li rojeke mîna wê ji sala 1898an, hejmara yekê ji rojnama KURDISTAN li bajarê Qahîrê çap bû û ronî dît. Bi wan çend rûpelên ku mîrê nemir Miqdad Midhet Bedirxan li wê demê bi tîpên Eerebî-Osmanî û bi zimanê kurdî nivîsandin, gaveke dîrokî ye pir giring hat avêtin û kevirê bingehîn a rojnamegerî û ragihandina kurdî bi zimanê kurdî hate danîn.

Her sal, weke dilsozî û wefadarî ji wê pêngav û roja pîroz re, îsal jî Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê, bone bi bîr anî û li pir deveran, li hundur û li derveyî welêt, gelek aheng, komcivîn û civatên taybet li dar xistin. Ji wan ciyan ev bûn: Qamişlê, Efrîn, Kobanê, Dêrîk, Dirbasiyê, Serê Kaniyê, Herêma Kurdistanê, Almaniya, welatê Nemsa û hwd.

Di ahengên ku li welêt li dar ketin de, gotineke hevbeş bi navê Rojnama NEWROZ û kovara PIRS hate xwendin. Gotin li ser rola çapemeniyê di civak û xebata gelê kurd de sekinî û karê wê ya pêwîst û giring danî ber çavan. Ev in hin xêz ji gotinê:

((Rojnamegerî di jiyana netew, civak û welatan de, roleke zor mezin dilîze. Ew çavdêriyê li pêvajoya hemî aliyên jiyanê dike. Raya giştî ava dike û guherînan jî çêdike... Lê erênî û neyêniya rola wê bi pirsa demokrasiyê ve girêdayî ye. Yanê çendî demokrasî geş û cîgirtî be, ewqas rola wê erênî dibe, û bervajî wê jî rast e... Wê lomê jî, em dibînin ku rojnamevan û çalakvanên rojnamegeriyê ji aliyê destlatên diktator, kevneperest, şoven û hêzên teror ve, têne armanckirin û kuştin jî.

Berî niha bi sed û nozdeh salan ronakbîrê Kurd ê gewre Miqdad Midhet Bedirxan li (22) Avrêlê, yekemîn ............. 7

# Vegera Bo Welêt



**Dr . Muhamed Zeyno**

Berî çend rojan em , komek ji Kurdên Rojavayê Kurdistanê li hev kombûn û wek her car gengeşe li ser rewşa Kurdan û mijara sereke paşeroja herêmên me, germ bû . Biraderên rûniştî gelek axifin û şor Kirin. Hina gotin rewş ber bi başiyê vê diçe, hinan gotin nexêr rewş gelek dijware, ronî li dawîya berqefê xuya nake. Ji ber ne diyariya rewşê wê ev koçberî her û her dewam be, mîna lehiyê diherike. Her weha mijara "vegerê " jî hate meydanê. Gelo law û dotên Kurdan rojekê ji Ewropa vegerin welêt? Iroroj ev babeta pirê caran di mejî û xeyala xelkê me de digere û diftile. Li vir pêwîst e mirov zanibe ku ew penaberê ku bi hezaran Euro û Dollar terxanî hatina Ewropa kirine û ewqas zehmetiyeke rê dîne û jiyana xwe tuşî metirsiyê kiriye û xwe li derya û newalan qelibandiye ta gihaye Ewropa û li bajarê van welatan bi cih û war bûye û jiyana rojane diqede û dimeşe û bi hêdî û aramî di jiyaneke rûniştî daye, ango zarokên wan diçin dibîstan û xwendigehan û hin mal û hebûn bi dest ketine û her alavên jiyana xweş peyda bûne, li ba vê giropê penaberan pirs û ramana vegerê bo welêt diyar nabe. Vê giropê xwe ji vê " serêşê " rizgar kiriye. Welat û xak û xizim û mervantî bûnê beşek ji dîroka kesane. Rojên li welêt bûne bîranîn û xewnên ciwan. Li gor ez ramana van kesan dişopînim , ewan çi mal - mewal li dûv xwe li welêt nehêştine, piraniya wan xanî û hebûna xwe firotine an jî " diyarî " xizmên xwe kirine. An jî ew rûniştiyên bajarê Helebê - Şamê bûn ku piraniya mal û dûkanên wan hatine kavil kirin û wêran kirin . Nûnertiya vê giropê pirsê ji xwe dike: Ezê vegerim kûderê ?. Ev kes bi gerimî û hêminî li xwe miqate ye ku paşeroja xwe li van welatan bi qedîne " hela heta xwedê çi dike ".

Her weha giropek din jî heye ji penaberan, ewa ku tebatî nakeve guvdê wan, ên xwe di jiyana rojane de li Ewropa nabînin, heroj bi gilî û gazinin, nifiran li wan kesan dikin ên bûne sedema koça wan . Piraniya wan ji gundan hatine, mal û hebûna wan di cih de maye , wêran nebûye. Ew bi her tiştekî li van welatan qayîl nabin, ew nefretê li heyama ezmanî dikin " ma ev welat e, ne buhar buhare, ne havîn havîn e " ne kes yekûdu dibîne, ne kes serdana yê din dike, " mêr ne mêr in " , ev welatê jina ye. Kesên weha bi Piraniya xwe naçin dibîstanan ta ku xwe fêrî xwendina ziman bikin , heger çûn jî bi rotînî diçin, ango ji " mecbûrî ". Ew xwe tevî tevna civakê nakin. Ev rewşa han bandoreke mezin li ser xwendin û jiyana rojane ya zarokên wan malbatan dike. Demê zarok dibihîse ku ewê Di dekem nêzîk de vegerin welêt , dibêje, nexwe ji bo çi ez xwe di xwendinê de biwestînim . Ev kesana di jiyaneke ne aram de dijîn.

Heger iro em bala xwe bidinê, emê bibînin ku her du girop hemahema bi hijamariya xwe wek hev in . Ji bo ku mirov kanibe li van welatan bi aramiya nefsî bijî, pêwîst e xwe ji van nakokiyan rizgar bike . Pêwîste sînorek ji vê tevliheviyê re bête danîn, ta ku aramî bikeve jiyana malbatê jî .

Li gor min... Heger hat û rewş li welêt zelal bû , dîsa jî kêm kes wê vegerin.

---

# Strana Xerîbiyê

**Zozan Ebdo**

Ev stran... Çiqilên giyana min dihezîne... Mîna berfa ku li ser darekê bi aramî xwe girtibe, ba wê bihezîne û ji bilindahiyekê bavêje erdê, weke wê jî ev stran hestên derewîn ji nav çiqilên giyana min dihezîne, û min bi sertî ji bilindahiya deresayî davêje ser zemîna rastiyê. Xwe dibînim ne li warê xwe me, li xwe dinêrim dibînim koçber im, penaber im, êdî nas dikim navê min Rêbiwar e. Ev navê ku narvînê li min kiriye, û ev stran daniye ……..

7

### Çalakiyên … Dûmahîk

rojname bi navê Kurdistan, bi zor û zehmetî derxist û deriyê ragihandinê li pêş nifşên nû bi zimanê kurdî vekir. Di dû re, bi dehan ger em nebêjin bi sedan weşan, rojname, kovar bi zimanê kurdî derketin holê. Yanê mirov dikare bibêje Kurd bûn xwediyê tevgereke rojnamegerî. Lê mixabin roja îro ji dest gelek kêmkasiyan dinale. Ji pirsa ku bûye kelem li pêş pêşketina rojnamegerî û ragihandina kurdî derdikeve, ew e, ku hîn piraniya wan di bin bandora partiyan de ne….)).

Di ahengên cejna rojnamegeriyê de, gelek kesayetiyên ku di warê rojnamegeriya kurdî de xebatên balkêş kirine û dikin bi xelatên taybet hatin spaskirin. Li derveyî welêt: Mirovê giranbuha Pirfêsor Celîlê Celîl û xwedî kar û xebateke kurdewerî ya berçav ku roja îro ew li welatê Nemsa rûdine, Mihyedîn Îso, Mistefa Ebdî, Emîne Misto, Mihemed Elî (Ronî Elî), Faroq Hecî Mustefa,…..û H.W.D hatin xelatkirin.

Li welêt jî rêzdar Dr. Mihemed Ebdo ji ber kar û xebata xwe ya di rojnemavaniya partiyê de, li ahenga bajarê Efrînê ji hêla Komîta Çand û Ragihandina partiyê de hate xelatkirin.

### Strana Xerîbiyê … Dûmahîk

pêşiya riya min , da ku carek din hêza xwe li hember her du çavên min ên melûl tOmar bike, û lîstokê dest xwe de bigire. Ev stran carekê weke berfê... Careka din jî weke birûskên payîzê ku xwe di nava ewrên ezmên de dibezînin û zemînê bi rondikên wê şil dikin, wisa jî di nav solînên hêviya min re dibeze, nizanim ger wê diçelmisîne, lê wisa nake. Lê bi semakirina bîranînên ku nebû werin jibîrkirin, êdî dizanim ku hin ewran xwe ji ezmên spartine çav û mijangên min. Ev stran.... Min dûr dibe û dihîne, lê wê kengî bighînim cihê xwe....nizanim.



### Gundê …. Dûmahîk

di nav gund de pir xanî û şikeftên kevin hene û hin gorên kevnar jî têne dîtin. Li bakurê gund du pîrozgeh hene (M.QÊZIQL, M.ŞÊX MIHEMED). Goleke avê ye pir mezin û kevnar li bakurî gund heye, ta roja îro mayî, goleke din jî bi çûk bû, li başorî gund hebû, lê mixabin ew hetiye xerakirin.

Li gorî pir agahiyan, dîroka vî gundî bêtirî (350)î salî ye, û li ser avabûna wî pir gotin hene, yek ji wan gotinan ev e : Sê bira ((ÊZÎD XELO– MÛRAD– ME`IM)) ji Şengalê koçber bibûne û li vî deverê ev gund avakirine.

Di dîroka gund de du bûyerên balkêş hene:Talankirina gund ji aliyê Çeteyên Mistefa Çolaq de, ku li sala 1929 an bû, û di wê talankirinê de sê kes hatin kuştin, navên wan (Xelê Nebî– Beşîrê Derwîş– Nebî Husên).

Di Tîrmeha sala 1963 an de, meşek li navça Cindirêsê hate lidarxistin di wê meşê de hin kesên ji erebê Cindirêsê siloganên li dijî şoreşa nemir mile Mistefa Berezanî hildan, di wê demê de hin xortên gund ev kiryar qebûlnekirin û heme xortek hildan ser milên xwe û bi yek deng bankirin: ((Bimire Cemal Ebdilnasêr, bijî serok Mistefa Berezanî)), ev yeka bû sedema girtin û darizandina pêncî xortî ji gund, nav û cezayên wan wiha bûn:

1-Teterî donê: Du sal. 2-Husênî Okêş: Du sal. 3-Şêx xelîl: Salek.

4-Muhemed Beşîr Murad: hat berdan ji ber ku ew ji her du



çavan de kor bû.

5-Beşîr Husyî Eynê (berber): Salik.

Di buhara 1986an de, çend xurtên gund, ji ber kar û xebata wan li nav refên Partiya kar ya Demokrat a Kurd li Sûriyê de hatin girtin, navên wan jî ev in:

(Husên Teremoş, Derwîş Ezro, Seîd Îso, Ebdilrehman Reşo).

Hêjayî gutinê ye, ku asta xwendinê li vî gundî pir bilind e, bi dehan kes xwendina xwe ya bilind bi dawî kirine .

# Sersal, Cejna Nûjenî û Aştiyê



Çareşema yekê ji meha Avrêlê bi demnaneya Rojhilatî li ba Kurdên li ser ola Êzdî Cejna Sersalê ye. Ew cejna bi Çarşema Sor jî tê binavkirin. Li gora baweriyên ola Êzdî, li wê rojê Firîşteyê Xwedê Melkî Tawûs dadikeve ser rûyê zemînê, li rewşa bawermendên xwe dipirse û jiyanek nû li ser zemînê dafrîne. Loma jî şana sereke ya Cejna Sersalê hêk e, ew bi hemî rengên sirûştê tên cîlawkirin û diyarî hev dikin. Li dehsalên berê û berî wê jî, rêwresmên cejina Sersalê li destpêka werza Buharê li ber pîrozgehan dihatin lidarxistin, qurban dihatin kirin û şahî li dar diketin. Bûne du sal, komela Êzdiyan li Efrînê, ku bi ser Rêvebiriya Xweser ve ye, rêwresmên wê li gundê Feqîra li dar dixe. Îsal jî bi sedan bawermendên ola Êzdî û xelkê Efrînê li şahiya cejnê amade bûn û pîroz kirin.

Bi navê weşana NEWROZ, karker û nivîskarên wê, em Cejna Sersalê li xelkê xwe yê Êzdî pîroz dikin. Aştî, aramî û serkeftin ji wan û ji hemî gelê Kurd hêvî dikin. Em hêvîdar in ku li Sersala bê, têror têk biçe û hemî zarok, keç, jin û mirovên Êzdî ku di destê têrorên Dewleta Îslamî(DAIŞ) de ne rizgar bibin û li mal û xwediyên xwe vegerin…

---



# Rojbûna Mîr Celadet Bedirxan

Mîr Celadet Alî Bedirxan, di warê çand û zanînê de, ji navdartirîn kesayetî ye di nav Kurdan di sedsala bîstan di warên çand, ziman û rojnavaniyê de. Celadet kurê Emîn e, diya wî Senîĥe ji nijada Çerkez e. Ew neviyê Mîrê Botan Bedirxan Paşa ye. Celadet li roja 26 Avrêla sala 1893an li Stenbûlê jidayîk bûye. Ango 124 sal di ser rojbûna wî re derbas bûne. Roja rojbûna Mîr Celadet rojeke buha û pîroz e li ba her Kurd û Kurmancekî. Ew bav û danerê Elfebê, rêzman û rênvîsa Kurmancî ye. Rêbaz û rêgezên ku wî di warê rêzmanê de danîne, bûne bingeheke xurt û durust ji hemî kurmancîzanan re. Em jî di weşana Newrozê de serbilind û piştrast in ku li ser rê û rêbaza wî dimeşin û şopa wî dajon. Rojbûna Mîrê gewre Celdet li me hemiyan pîroz be..

---

# Gundê Kefirsefrê

EN. ZAGÎ

Gundê Kefirsefrê yek ji gundên mezin ên herêma Efrînê ye. Ew di navçya Cindirêsê de cih digire û li bakurî bajêr bi (15 km) dikeve. Deşteke fereh tevde darên zeyîtûnê wê hembêz dike. Li bakurî gund, çiyayê Qêziqlî, mezelê şehîdan û gundê Tetera heye. Li başûrê wê bajarokê Cindirêsê û gundê Yalanqozê hene. Li rojava, gundê Aşkayê Rojava tê. Li rojhilatî gundê Sîndankê heye, û li Bakur- Rojhilatî jî gundê Kora heye. Herjmarên niştecihên gund bêtirî (8000) kes in, li ser derdora (850) mal belav dibin. malbetên sereke ku di gund de dijîn ev in: Malbeta Îbikê, Hac Ebdo, Zagî, Mûrêd, Hevêdî, Îdo, Horo û Fatê.

Di gund de du dibistan (seretayî – amadehî) hene. Şaredarî jî lê heye. ……… 7

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de**

Êmêla Newrozê: Newroz@yek-dem.com